# Eşîret û karlêkeriyên vê

Li Rojhelatê Kurdistanê nakokiyên eşîrî di nav kêşeyên sereke yên vê herêmê de ne. Yek ji wan herêmên ku ev cudahî bi tundî lê tên dîtin, Rojhilatê Kurdistanê ye. Cudahiyên eşîrî bandorê li pêkhateya civakî dike.

dom»R:5



# Roja Şehîdên Kurdistanê

Di pêvajoya dîroka hemû gelên cîhanê de, mirovên ku jiyana xwe di rêya welat û azadiya gelê xwe de didin, nirxên mezin ên wê civakê tên hesibandin. Rêz ji canfîdayî û fîdakariya wan tê girtin û hersal tên bibîranîn.

dom» R:4

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (467)04-04-2024Buha (1000) Tûmen*

# Dilgiraniya Rûsiyê ji nêzîkatiya Ermenistanê ji bo Yekîtiya Ewropa!

Ev çend sal in ku Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkiyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenistanê. Piştî ku Rûsiyê li ser mijara Qerebaxê pişta Ermeniyan berda, niha Ermenî nêzîkî Ewropayê dibin û ev jî nerazîtiya Rûsiyê li pey xwe ve tîne.

dom» R:7

# Peyma rêzdar Mistefa Hicrî bi hilkevta roja Şehîdên Kurdistanê

Deqa peyamê wihaye:

Roja 10ê Xakelêwa 1326an a rojî, li dîroka netewa me de bîranîna bûyerekî cihê xembariyê ye ku ti carî nayête ji bîrkirin.

Li wê rojê de Pêşewa Qazî Mihemed, Serkokê Komara Kurdistanê tevî Ebulqasim Sedrê Qazî û Mihemed Husêynê Seyfê Qazî hatine sêdaredanê, lê nav û yadê wan bûye remza dîroka xenat û berxwedaniya Kurdistaniyan.

Xelkê Kurdistanê li wê rojê de ku bi roja Şehîdên Kurdistanê hatiye navdêr kirin, serdana mezarê Şehîdan û malbatên wan dikin û pêymana domandina rêbaza Şehîdan li gel riha wan nû dikin.

Roja 10ê Xakelêwê, wateyekî hevpar bal xelkê Kurdistanê heye, ev jî domandina rêbaza pir serweriya Şehîdan û zindî ragirtina rêbaza neteweyî ye Pêşewayê Kurdane.

Li wê rojê de, tevî serî tevandin li hember riha paqije şehîdên Kurdistanê de û pêyman nû kirina tevî rêbaza wan, em silavên emegdariyê dişînin bo hemî malbatên serbilinde Şehîdan.

Mistefa Hicrî
Berpirsê Navenda Birêveberia Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê
9ê Xakelêwa 1403 a Rojî




# Şehîd bi jiyana xwe welatekê ava dike

Ev roja ku di bêdadgehiyeke rejîma zêdexwaz a Paşayetiyê de, cezayê îdamê yê nemirovane bi ser Pêşewa yê nemir hat dayîn, wî got hûnê Qazî Mihemedekî bi dar vekin, lê ev Kurdistane dê tejî be ji hezaran Qazî Mihemedên dinê!

Nemir Dr.Qasimlo ji hevalên xwe re gotibû ku piştî mirina wî bila li ser gora wî binivîsin: Dema ez bimirim Kurd namir e! Nemir Dr.Seîd di rêûresima taybet a ji bo bîranîna Dr:Qasimlo de got: Em soza xwe digel şehîdên xwe nû dikin ku yan di vê rê de serdikevin yan serê xwe di vê rê de didin.

dom» R:3

# Navenda Karûbarên Civakiya Hizba Dêmokrat bi hilkevta 10 xakelêwê daxûyaniyek belav kir

Deqa daxûyaniyê wihaye:

Xwîna bi neheq rijandiye şehîdên çiya û şeqaman, dê bibe hêvin û sedema azadiya gel
(Peyam bi hilkefta 10ê Xakelêwe, Roja Şehîdên Kurdistanê)
Malbatên Serbilind ên şehîdan!
Hevçeperên xweragir ên şehîdan!
Xelkê gernas û hertim amadeyê li meydanêye Rojhilatê Kurdistanê!
Piştevanên qahîm û bi emegdare tevgera rizgarîxwazaneya Kurdistanê!

Îro 10ê Xakelêwe, “Roja Şehîdên Kurdistanê” ye.

dom» R:2

# Navenda Karûbarên Civakiya Hizba Dêmokrat bi hilkevta 10 xakelêwê daxûyaniyek belav kir

**Deqa daxûyaniyê wihaye:**
**Xwîna bi neheq rijandiye şehîdên çiya û şeqaman, dê bibe hêvin û sedema azadiya gel**
**(Peyam bi hilkefta 10ê Xakelêwe, Roja Şehîdên Kurdistanê)**
**Malbatên Serbilind ên şehîdan!**
**Hevçeperên xweragir ên şehîdan!**
**Xelkê gernas û hertim amadeyê li meydanêye Rojhilatê Kurdistanê!**
**Piştevanên qahîm û bi emegdare tevgera rizgarîxwazaneya Kurdistanê!**

Îro 10ê Xakelêwe, "Roja Şehîdên Kurdistanê" ye. Roja bidarvekirina "Qazî Mihemed" û hevalên vî ji aliyê rêjîma dîktatore Pehlewî û roja bi bîranîna hezaran şehîdên vê av û axê û niştimanê ye ku li ser parastina şunas û nasnameya netewiya xwe ji aliyê komara Îslamî û neyarên Kurdan ve, xwîna wan rijyaye ser ax û şeqamên pîroz ên Kurdistanê. Lewma li vê rojê de hem divê li beranber rihê bêqirarê hemû "Şehîdên Komarê û Kurdistanê" û bi taybet şehîdên şoreşa Jîna yê "Jin Jiyan Azadî" û malbatên xweragir û serbilind ên wan şehîdan, serê rêzê ditevînin û hem divê tevî serdana gorên pîroz ên şehîdan, digel malbatên serbilindên wan bin û soz û peymana xwe digel wan nû bikin û heta hivî û daxwaziya hemû şehîdan û serweyî karwanê şehîdan ve "Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî" bi cih neyînin, dest ji xebat û berxwedanê bernedin. Bi wan re bibêjin heta dilê daiyk û bavên cergşewitî û xweîşkên reşpoş hêsayî nekin, xebat û berxwedan, berdewam e. ew meşxele bi nirxeke gelek giran anku bi xwîna hemû şehîdan û bi taybet şehîdên serhildana "Jin Jiyan Azadî"yê hatiye hilkirin û nehêlin ku ew agire, bitemire û bi geş û gurî bigîhînin encamê.

**Malbatên serbilind ên şehîdan!**

Serqafileya karwanê şehîdan, Qazî Mihemmedê nemir li heyama avakirina Komara Kurdistanê de gelek destkevtên bi nirx bo gelê Kurd bi dest xistin. Mixabin temenê Komarê kêm bû û çê nebû ku Kurd li jêr sîbera wan destkevtan de aramiyê bi xwe ve bibîne. Beşek ji wan destkevtane ew in: "Bi fermînasîna zimanê Kurdî û bikaranîna vê li xwendingehan û îdareyên hikûmî li Kurdistanê, avakirina Artêşa Kurdistanê, şandinina xwendekaran bo welatên din, girîngîdan bi jinan û karpêdan bi wan li karûbarên siyasî û civakî, girîngîdan bi weşan û azadiya gotin bo nivîskar û helbestvanan û gelek destkevtên din". Qazî Mihemed gelek nirx û bihayên civakê li Kurdistanê de geşe pêda û li jêr vê geşedana civan de çavê gelê kurd vekir ku divê, qedera xwe bi destê xwe ve bigre û wek netewek bextewer û serbest ên cîhanê, xwediyê ziman û kultûr û xwediyê serwerî û kiyan û niştimana xwe be.

Lê rêjîma dîktator û neyarên navxwe û derve, çavê dîtina destkevtên Komara Kurdistanê nebûn, lewma Mihemedriza şah, fermana girtin û bidarvekirina "Qazî Mihemed" û hevalên wî da û piştî dadgehîkirina şanoyî li 10ê Xakelêweya 1326 a Rojî, li meydana "Çarçira" ya bajarê Mihabadê de bidar vekirin. Şah wa dihesiband ku bi lêdana serê rêberek, neteweyek ji kokê ve hişik dibe û pirs û mafxwaziya vê netewê, li Kurdistanê binbir dike. Lê nezanî netewe namire û li ser koka xwîna şehîdan şîn dibe. Kurd bi vê karesata nacamêrane nayê şikandin û hertîm li ser pê xwe dimîne û rê û rêbaza kesên mezin ên xwe wek Qaziyan û rêberên din ên Kurd, berdewam dike.

**Xelkê xebatkar û hertîm li meydanêye Kurdistanê!**
**Jin û ciwanên hişar û azadîxwaz!**

Li demekê de em yada şehîdên serbilind ên Kurdistanê bi bîr tînin ku bêzariyeke seranserî û navnetewî li dijî rêjîma cinayetkar û tepeserkerê Komara Îslamî tê kirin û pitir ji her demekê, hitbar û baweriya rêjîmê li navxweyê welat û li asta navnetewî de kevtiye jêr pirsyarê. Sala par, çexmaqê agirê serhildanê bi şehîdkirina "Jîna Emînî", keçe kurd xelka bajarê Seqizê ji aliyê geşta Îrşad, li bajarê Têhranê hate lêdan û agirê vê li Kurdistanê geş bû û piştre peşqelên wî agirî, seranserê Kurdistan û Îranê li xwe girt. Nivşa nû bi bivêrî û hişyarane




û bi sehkirina berpirsayetiyê li ser şeqaman, tinê kerba pangurî ya 45 sal sitem û rojreşiya xwe rijandin û rêjîma Komara Îslamî li asteke herî bilind de rastî nigeranî û rastî aloziyê kirin. Rêjîm bi rêya kesên girêdayî bi rêjîmê û kesên hevsarkiriyê xwe bi awayekî nemirovane kevte nav xelkê kerbvebûyî û nerazî ji desthilatê, bi her awayek her karek ji destê wan hat, xwe jê neparastin û destdirêjî bi ser yekîtiya xelkê kirin û kirameta jin û mêrên mafxwaz binpêkirin. Hejmareke gelek zêde ji xortên gelê Kurd û gelên din ên Îranê bi taybet gelê Belûç şehîd û birîndar kirin û vê carê bi awayekî dirindane kevtine canê xelkê û hejmareke zaf ji kur û keçan binçav kirin û xistine nav zîndanê û xistine jêr dijwartirîn îşkenceyan de û hejmarek ji wan bidar vekirin û hejmareke zêde ji wan jî girtîgehên demdirêj bi ser de sepandin.

Niha ku salek û nîv ji şoreşa nû ye gelên Îranê derbas dibe, komara Îslamî ne bi tenê li hizra navnetwî û welatan de rastî bêzariyê hatiye, belku bi berdewamî û bi micidî kevtiye jêr dijwartirîn dorpêçên aborî û siyasî. Siyasetvan, hunermend, nivîskar û keseyaetiyên navnetewî bi şêwazên cur bi cur, bi sedema neparastina bi giştî ya mafê mirovî û rêkarên exlaqî û bi taybet bidarvekirina gelek zaf a ciwanan, li dijî komara Îslamî dengê xwe bilind kirine û nerazitiya tunda xwe dane nîşandan. Desthilardarên komara Îslamî, bê guhdan bi wan nerizayetiyan, bi berdewamî tepeserkirin û bidarvekirina xelkê berdewam dike. Ew reftarên dijî mirov ên rêjîmê neku nekarî xelkê neçar bi paşekêşiyê bike, belku jin û ciwanê bivêr û xweragir ên Kurdistanê, micidtir û yekgirtîtir kiriye. Her wek bo pêşewazîkirin û rêzgirtin li "Kulek Çarşemî" û Newroza pîroz a meşxelên 2724 a Kurdî bi kincên bi rengê alaya Kurdî û axabanî û hewriyan û govend û dîlanê û şayîkirinê, şana xelkê me li ser şeqamên bajaran û gundên Kurdistanê de hate dîtin ku çawa dîsan bi şana xwe tirs xistine dilê desthilatdarên Îranê û dane selimandin ku heta serkevtinê û bidestveanîna dawazî û hiviyên Şehîdên li nav xwînê de vegevizî, şeqaman, Jin Jiyan Azadî û hemû şehîdên gel, meydanê bernadin û şana şeqaman bi avedanî radigrin û heta herifandina yekcarî, berdewam dibin.

**Xelkê azadêxwaz û niştîmanperwer û liserpêsekiniyê Kurdistanê!**

Gelên yekgirtî û serîhildayê Îranê!

Gelên bêzarbûyî yên Îranê bi îrade û cehd û tekoşîna xwe, otorîte û peykerê rêjîma komara Îslamî li asta navnetewî û navxweî de têk şikandin û rewatiya vê birine jêr pirsyaran û heta ser lêva herifînê birin. Gelên Îranê biryar dane heta xevnên civan ên hemû şehîdan û şoreşa Jînayê, bi dest ve neyînin, dest ji xebat û berxwedanê hilnagirin û pêvajoya xebat û rawestanê li ser şeqamên Kurdistanê dê her berdewam bin. Soza man û sekinîn bi malbatrên şehîdên tevgerê û bi giştî şehîdên xebata ser şeqaman û giştî girtiyên siyasî didin, soza wefadarî û emegnasiya xwe digel rihê paqijê "Qazî Mihemed" û hevalên wî ku bi azatî û camêrane çone bin darê sêdareyê û hemû şehîdên tevgera azadîxwazane û ciwanên li nav çalereşê û ciwanên vegevizî li nav xwînê li ser şeqaman, dûbare dikin û rêbaza wan berdewam dikin.

Li roja 10ê Xakelêweyê, Roja Şehîdên Kurdistanê, silav û rêzgirtinê bo rihê hemû şehîdên çiya û şeqaman dişînin û li hember rihê paqijê wan şengeswarên vegevizî li nav xwînê û li beranber malbatên serbilind ên şehîdan, bejna xwe ditevînin û soz didin wan ku heta xevna zarokên wan bi dest ve neyînin, nasekinin, bêhnê venadin û rêbaza wan heta serkevtinê berdewam dikin

Silav li rihê paqijê serwerê şehîd "Qazî Mihemed"ê nemir û hevalên wî!

Silav li hemû şehîdên xebata çiya û bajar!

Silav li gelên azadîxwaz û xelkê bivêr ên ser şeqaman!

Silav li malbatên serbilind ên şehîdan!

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Navenda Karûbarên Komnelatî**
**10ê Xakelêweya 1403 a Rojî**

# Şehîd bi jiyana xwe welatekê ava dike



N. Kerîm Perwîzî




Ev roja ku di bêdadgehiyeke rejîma zêdexwaz a Paşayetiyê de, cezayê îdamê yê nemirovane bi ser Pêşewa yê nemir hat dayîn, wî got hûnê Qazî Mihemedekî bi dar vekin, lê ev Kurdistane dê tejî be ji hezaran Qazî Mihemedên dinê!

**Nemir Dr.Qasimlo ji hevalên xwe re gotibû ku piştî mirina wî bila li ser gora wî binivîsin: Dema ez bimirim Kurd namir e! Nemir Dr.Seîd di rêûresima taybet a ji bo bîranîna Dr:Qasimlo de got: Em soza xwe digel şehîdên xwe nû dikin ku yan di vê rê de serdikevin yan serê xwe di vê rê de didin.**

10ê Xakelêwê salroja îdamkirina Pêşewa û hevalên wî ji aliyê desthilata xwe sepîn û zêdexwaz a Paşayetiyê ve ye, di dirêjahiya tevgera neteweyî demokratîk a Kurd de, bi hezaran kesî di vê rêbazê de canê xwe goriyê serwerî û bexteweriya Kurdistanê û netewa Kurd kirine, li pêxema avakirina welatekî tijî avedanî û wekhevî û dadperweriyê de canê xwe yanî mezintirîn sermaya jiyanê fîda kirine, û ji ber wê jî ji bo rêzgirtin, bibîranîn û berdewamkirina bîranîn û rêya hemû şehîdên Kurdistanê, 10ê Xakelêwe wek roja şehîdên Kurdistanê hatiye naskirin..

Şehîdbûn di rêyeke tijî serbilindî û serwerî de, wateyekê ji ramana kûr a ku rêberên şehîdan wane dane digire. Di waneya dîrokî ya ku di tevahiya jiyana têkoşîn, fîdakarî û qurbanî dan li Kurdistanê de hatiye bidestxistin û rêberên vî gelî behsa wê kirine, şehîdbûn tê wateya dubarebûna bi hezaran takên têkoşer.

Di wê wateyê de ku nemir Pêşewa dibêje, mirin û îdamkirin ne dawiya şehîdekî ye, belkû destpêkek din e ku bi hezaran kesên din di vê riyê de pêngavan dihavêjin, di heqîqetê de wêneya xebatkariyê bi hezaran lê çê dibin û di nav kûrahiya civakê de tovê xebat û cangorîkirinê tê çandin, nifiş li pey nifişê xebatkarên mafxwazên din serî radikin ji nû ve derdikevin holê û her ji ber vê yekê ye ku dibêje bi îdamkirina Qazî Mihemed bi hezaran Qazî Mihemedên din dê çêbibin.

**Heman waneya ku Dr.Qasimlo berdewamê rêya Pêşewa ye, di qonaxeke din de dibêje, Kurd bi mirina min namirin! Yanî şehîdbûn ne mirina neteweyekê ye, bûyîna bi hezaran îradeya têkoşînê ye ku neteweyekê zindî dihêle.**

Lewma waneya têkoşînê û karwana têkoşînê ji devê Dr. Seîd de berdewam dike û dibêje yan em ê serê xwe li pêxema serbilindiyê de dabinên yan jî em ê li jordahiya serbilindiyê bi dest bixin! Ev peyama girîng a berdewamkirina têkoşînê û jidayikbûna îradeyê û îsbatkirina hebûna neteweyî ye ku dibêje bi şehîdkirina kurên xwe yên bijarte ez teslîm nabim, hebûna xwe îsbat dikim û welatekî geş ava dikim. Peyama ku em ji şehîdên Kurdistanê distînin, heman waneya hêja û heta hetay ye ku rêberê me yê şehîd dibêje: Baştirîn xelat ji bo şehîdan berdewamkirina rêya wan e.

Me mêjveye soz daye ku em li ser şehîdbûna şehîdên xwe negirîn û dest li ser çokan nemînin. Di heman demê de em berdewamkirina rêya şehîdan bi tolhildanê nahêlin jiberku canê wan di şereke şexsî de nehatiye standin da ku bi tolhildanekê dawî bi mijarê bê belkû şehîd canê xwe li pêxema avakirina nîştimanekê bo azadî û wekhevî û dadperweriyê gorî kiriye, Tevî ku divê rojekê destên sûcdaran bên kurtkirin û sûcdar di dadgeheke dadperwerî de bên cezakirin jî, em li şûna tola şehîdên xwe yên ku ji bo edalet û azadiyê gorî bûne û tenê bi berdewamkirina rêya wan şehîdên xwe bidomînin wiha xewna tolhildana rastîn dê pêk were.

Lewma jî bi vê felsefeya têkoşînê û berdewamkirina rêya ku em dibînin, pêvajoya têkoşîna Kurdistanê gihiştiye wê astê ku di şoreşa Jînayê de neteweyek bi giştî li ser hest û helwest û serhildana li dijî zilmê bûye erkek rojane, Ev peyama girîng a rêberên şehîdên Kurdistanê ye ku gihîştiye her kuncikekî welat û bi sedan kes di şoreşa Jînayê de canê xwe fîda dikin da ku bigihêjin xewna azadî, serxwebûn, dadperwerî û welatê ne xerîbê xwe. !
Lewma di berdewamiya şoreşa Jînayê de, di Newroza meşaleyên rizgariyê de, yên ku agirê Newrozê pêdixin, bav, dayik û malbatên serbilind ên şehîdan in di rastiyê de pêxistina meşalên rizgariyê bi destê ciwan, jinan û mêrxasên welat in û agirê dirêjedan bi rêbaza şehîdan geş radigirin.

Nêrîneke kurt li pêvajoya têkoşîna neteweya demokratîk a Kurdistanê ya ji serdemê Komarê ve, ji me re dibêje ku bêyî fîdekariya lawên leheng ên welat û pêşengiya rêberên hişyar û fîdakar ên Kurdistanê, ev têkoşîn ewqas berfireh nedibû, em dibînin ku êdî erkê tekoşîna ji bo daxwaz û armancan ne tenê li ser milê çendîn têkoşer û tekoşîna Kurdistanê ye ji bo avakirina welateke tijî dadperwerî, îdalet û azadî, li seranserê Kurdistanê bûye tekoşînek girseyî. .

Di dawiyê de, bi bîranîna hemû şehîdên Kurdistanê, hemû şehîdên ku di rêya azadiyê de canê xwe gorî kirine, ji şehîdên Komara Kurdistanê heta şehîdên dawî yên van roj û mehên dawî, silavên xwe ji hemû malbatên serbilind ên şehîdan re dişînin, û herwisa soza berdewamkirina rêya şehîdên Kurdistanê dubare dikin.

Şehîdbûn ji bo me ne pîrozkirina mirinê ye, ji bo têkoşîna îro ya serbilind û ji bo nifşên paşerojê jiyanek azad û bextewar e.

**Bîranîna şehîdan bilind û Kurdistan serbilind be**

# Roja Şehîdên Kurdistanê



**N. Azad Kurdî**

Di pêvajoya dîroka hemû gelên cîhanê de, mirovên ku jiyana xwe di rêya welat û azadiya gelê xwe de didin, nirxên mezin ên wê civakê tên hesibandin. Rêz ji canfîdayî û fîdakariya wan tê girtin û hersal tên bibîranîn.




Bo neteweya Kurd jî wekî gelên din ev yek hebûye û heye. Bi sedan gelên cîhanê di sedsalên 19 û 20'an de serxwebûna xwe standin û bûn xwedî dewlet, lê ji ber rewş û demografiya taybet a Kurdan li Rojhilata Navîn, heta îro jî Kurd nebûne dewlet.

Di pêvajoya wan çend sedsalên borî de, bi hezaran kesan bona rizgarî û mafên neteweyî yên Kurdan, bi awayên cuda cuda jiyana xwe pêşkêşî azadiya Kurdistanê kirine.

Beşek ji wan di hêrişên dujminên dagîrker de hatine kuştin, teror û îdamkirin. Dîrokek tejî ji xwîndan û canfîdayî bona jiyaneke birûmet û azad.

**Bo cara yekemîn di nava tevgera rizgarîxwaziya Kurd de li Rojhilatê Kurdistanê, PDKI li 30 Adara sala 1979'an, Komîteya Navendî ya PDKI biryareke girîng û dîrokî da.**

Bi armanca rêzgirtin ji canfîdayî û fîdakariya yekemîn Serokomarê Kurdistanê, roja lidarvekirina Pêşewa Qazî Mihemed serkomarê Kurdistanê û hevalên wî bi destê rêjîma dîktator a Pehlewî ya Îranê, weke « Roja Şehîdên Kurdistanê » hate binavkirin.

Ji wê demê pê de hersal di vê rojê de bi çalakiyên cuda Qazî Mihemed û hemû şehîdên Kurdistanê tên bibîranîn û rêz ji wan tê girtin.

**Hewce ye ku diyarîkirina vê rojê weke boneyeke partiyekê jî neyê dîtin û berçavgirtin, belkî bona gihîştin bi armancên neteweyî û rizgariyê di çarçoveya tevgera Kurdistanê de bê wergirtin.**

Ji ber ku Pêşewa Qazî Mihemed yekemîn Serokomarê Kurdistanê bû ku bi fermî hate ragehandin û bi hêrişa hovane ya artêşa rêjîma Pehlewî, Komara Kurdistanê piştî 11 mehan desthilatdariyeke bê mînak û dîrokî hate hilweşandin û Pêşewa Qazî û gelek rêveberên Komarê hatin îdamkirin û bûne şehîdên Kurdistanê.




Ji vê yekê girîng û berçavtir, piroseya mehkemekirin û berevaniyên dîrokî û biwêrane yên Qazî Mihemedê rêber li hemberê bêdadgehên rêjîma Pehlewî heta astekê mêjûyî bûn ku piştî 7 nifşan jî, hêj Qazî Mihemed sembol e bo gel û civaka xwe.

Herwekî Pêşewa dema ku bêdadigeha şanoyî a rêjîma pehlewî de, ku hikmê îdamê bi ser de sepand, gotiye: Ger hun min anku Qazî Mihemed bikujin, dê pêşerojê de hezaran Qazî Mihemedên dine li ser vê av û axê de çêbin û dê li hember we de bisekinin.

Belê herwekî Pêşewa kermkirî, îro piştî 76 salan nav û yad û rêbaza ku qazî û hezaran şorişvanên dine cane xwe li pêxemê de gorî kirinî, li heçî demê zêdetir zindiye û li rojevê de ye

bi milyonan xortên Kurd yên evîndarên azadî û serbestiya Kurdistanê, îro xwe rêvîngên rêbaza Qazî dizanin û armanc û ramanên siyasî û netewî yên Pêşewa li hizr û dilê wan de ye û li dema bîranîna Şehîdan û bi taybetî Pêşewayê Kurdan de, hemî care peymanê ligel xwîn û rih û rêbaza Qazî û hemî şehîdên Kurdistanê nû dikin.

Îro em dibînin ku malbatên Şehîdên Kurdistanê û xelkê welatparêze Kurdistanê hemî wan kesên ku li rêka azadiya Kurdistanê û armancên netewî de cane xwe gorî kirinî

bi Pêşewa û Qazî Mihemedek dizanin, herwisa Heçî yêk ji xebatkarên Kurdistanê û doza netewî xwe Qazî Mihemedek dizane û xebatê dike bo geheştina bi wan armancan, ku Pêşwea Qazî Mihemed û Şehîdên dine cane xwe jê re fîda kirin.

Ku wisaye Kurdistan îro tejiye ji xortên Qazî û rêvîngên rêbaza wan şehîdan, ewa dijminê xwînmij û dijî kurde ku bi kuştin û îdam û terror û êrîşê nekariye bigehîje armanca xwe ku matkirin û kok qelandina hizra siyasî û netewiye, herwisa ew netewa Kurde ku bi îrade û hêzekî yêkgirtîtir û qahîm û bi hişmendiya siyasî û serdem ji heçî demê zêdetir li meydana berxwedanê de maye û hemî warên jiyana xwe kirine qada berxwedan û xebata bi dijî dagîrkera.

Yadê rêberê mezin û pêşewayê Kurdan û hemî şehîdên Kurdistanê herim li dil û mêjiyê gelê kurd de zindiye.

# Eşîret û karlêkeriyên vê



**N. Hûmen**

Li Rojhelatê Kurdistanê nakokiyên eşîrî di nav kêşeyên sereke yên vê herêmê de ne. Yek ji wan herêmên ku ev cudahî bi tundî lê tên dîtin, Rojhilatê Kurdistanê ye. Cudahiyên eşîrî bandorê li pêkhateya civakî dike.


Her wiha rejîma Îranê bi kiryarên xwe hewlê dide bi reşandina tovê eşîretî gelê me parçe bike, da ku pêşî li belavbûna hesta netewî di nava Kurdên vê herêmê de bigire. Armanc û stratejiyên dijminane yên rejîma Îranê bi dabeşkirina netewa Kurd bi ser Êl û Eşîr û Tayfe û Malbatan, li ser esasê pêşî girtin ji pêkhatina hesta netewî di nav gelê Kurd de ye ji bo kontrolkirin, rênîşandan û tepeserkirina vê neteweyê ye.

**Rejîma Îranê kurdan wek mezintirîn kêşe û metirsiya li ser ewlehiya xwe dibîne û dizane ku kurdan bi salan e ji bo avakirina welatekî serbixwe gelek xebat kiriye û qurbanî dane.**

**1.** Parçebûna netewa Kurd bi ser êl û eşîran û bandora nerêniye wê li ser yêkitiya neteweya Kurd.

Parçebûna netewa Kurd bi ser eşîretan li Rojhilatê Kurdistanê ji ber dîrok û erdnîgarî ya vê herêmê gelekî girîng e. Ev dabeşkirin bi ser eşîran, nijad an herêma erdnîgarî tê kirin. Ev motîvasyonên çandî û dîrokî dikarin bibin sedema zêdebûna cudahiyên eşîrî û kêmkirina yekitiya netewî. Wek mînak, kesên ji qebîleyekê dikarin xwe ji kesên eşîreke din cuda û dûr hîs bikin, ev jî dibe sedema xurtbûna nijadperestî û nakokiyên civakî. Dibe ku ev cudahî di warên civakî yên cuda yên wekî aborî, siyaset, çand û nasnameyê de bi bandor bin.

**2.** Tedbîrên hikûmetê ji bo dabeşkirinê:
Hikûmeta Îranê bi hin kiryar û siyasetên xwe hewl dide netewa Kurd bi ser eşîran parçe bike. Di nav van kiryaran de pêşxistina çanda neteweyî an jî tehrîkkirina cudahiyên eşîrî hene. Weke mînak di belavkirina çavkanî û îmkanan de nakokî çêdibin, ji bo her qebîle îdeolojiyên siyasî yên cuda didin nasîn û di medyaya dewletê de jî ev nakokî û cudatiya



berdewam tête zeqkirin. Bi van polîtîkayan cudahî û aloziyên eşîrî zêde dike û di encamê de yekitiya netewî li vê herêmê kêm dibe.

Cudahiyên eşîrî li Kurdistana Îranê wek kêşeyeke girîng a civakî derdikeve holê ku bandorên cidî li ser yekitiya civakî û geşepêdana civakî dike. Dabeşbûna eşîran û tedbîrên hikûmetê yên ji bo parçekirina van cudahiyan îmkana hevgirtina civakî kêm dike û aloziyên civakî zêde dike. Ji bo çareser kirina vê pirsgirêkê, pêwîste giringiyek taybet bê dayîn bo pêşxistina çanda pêkvejiyan û hevgirtinê, bilindkirina asta hişyariya netewî û dabînkirina derfetên wekhev ji bo hemû hemî parên civakê bi bê cuatiya eşîrî.

**Li vir çend armanc û stratejiyên giştî yên ku rejîma Îranê ji bo rûbirûbûna Kurdan û dabeşkirina kurdan bi ser eşîretan de ev in:**

**1.** Tehrîkkirina nakokî û aloziyan: Rejîma Îranê dibe ku bi zêdekirina netebayî yan û aloziyan di navbera êl û eşîr û girûpên Kurd de, hewl bide yekrêzî û hevgirtina wan lawaz bike. Ev kiryar dikare alîkariya kontrolkirina wan bike û pêşî li pêkhatina tevgerên netewî li dijî rêjîmê bigre.

**2.** Temirandin û lewazkirina îrada netewî: Rejîma Îranê dibe ku bi danasîna îdyolojiyên tundajo û bi pêşxistina paremayî û kevneşopiya îdolojî di navbera komên Kurd de, nakokiyan zêde bike. Ev îdeolojî dikarin alîkariya bihêzkirina hikûmetê û kontrolkirina civakê bo rejîmê bikin.

**3.** Tepeserkirin û heqaret: Rejîma Îranê dibe ku bi tepisandin û rûreşkirina civaka Kurd û bêsînorkirina maf û azadiyên wan hewl bide ku civaka Kurd kontrol bike û lawaz bike. Ev tedbîr dikarin motîvasyon û şiyana berxwedan û têkoşînê ya Kurdan kêm bikin.

**4.** Pêşîlêgirtina geşepêdana çandî û civakî: Rejîma Îranê dibe ku bi rêgirtina li pêşketina çandî û civakî ya Kurdan, rê li ber geşbûn û bihêzbûna vê komê bigire. Ev kiryar dikare bibe sedema kêmkirina îmkan û derfetên gelê kurd ji bo pêkhatina tevgerên siyasî û civakî.

**5.** Pêşxistina dubendî û ferq û cudatîdanînê: Rejîma Îranê dibe ku bi pêşxistina dubendî û cudatîdanînê li dijî kes û komên Kurd hewl bide ku alozî û nakokiyên zêdetir di civakê de çêbike. Ev kiryar dikare bibe sedema lawazbûna yekîtî û yekrêziya Kurdan û zêdebûna xwepêşandan û dijberiyan.

**6.** Siza û sînordarkirinên aborî: Dibe ku rejîma Îranê bi sepandina siza û dorpêçên aborî li ser navçeyên Kurdistanî hewl bide ku aborî û şiyanên vê girûpê lawaz bike. Ev çalakî dikare siberojê aborî û civakî ya Kurdan kêm bike û têkoşîna wan lewaz bike.

**7.** Bikaranîna girûpên wêranker: Dibe ku rejîma Îranê bi piştevaniya ji komên wêranker û terorîst hewl bide ku nehêminî û tirsê li navçeyên Kurdistanî zêde bike.
Ev çalakî dikare lawazbûn û tirsa gel zêdetir bike û bibe sedema kêmkirina têkoşîna wan.

Di encamê de, rejîm li ser pêşvebirina çanda me ya têkilî û hevgirtinê di navbera Kurdan de gelek hesas e. Hikûmet ji bernameyên çandî û perwerdehiyê mirovan hişyar dike da ku çanda danûstendin, hevgirtin û rêzgirtina ji hev di navbera qebîle û komên civakî yên cihêreng de pêşve bibe. Ev bername dikarin ramanên erênî derxînin pêş û baweriya hevbeş di navbera gelê kurd de zêde bikin.

Her wiha hikûmet xwe ji pêşxistina têgihiştin û hevkariyê di navbera gelê Kurd de dûr dixe û ji bo ku asta pêywendiya di navbera wan de baştir bike.
Ji ber ku rêjîm dizane ku ev tedbîr dikarin bibin alîkar ku yekitiya netewî xurtir bibe û aloziyên eşîrî kêm bin û di dil û mejiyê gelê kurd de hesta yekîtiyê şiyar bibe.

# Di dîrokê de yekem hevpeyvîna çapemeniyê kengî bûye?



N. Vênûs Fayîq

**Hevpeyvînên çapemeniyê kengî bûne pîvana berhevkirina agahiyan li ser nûçeyan? Werger û amadekirin li Înglîsî bo Kurdî: Vênûs Fayîq**

Di dîrokê de yekem rojnameya Oxford Gazette bûye, ku di sala 1665`an Zayînî de ji hêla Modîman ve di kele kela Belaya Mezin a Ta`ûnê de hate weşandin.

Ew rojnameya yekem tê hesibandin ku hemî taybetmendiyên rojnameyek rastîn heye.

Destpêka tomarkirina çapkirî û parastina agahiyê, ku bingehê rojnamegeriyê danî, vedigere destpêka salên 1400`an dema ku bazirganên Îtalî û Almanî dest bi berhevkirina pelên destnivîsar ên bûyerên girîng tomar dikirin.

Di gel yên ku bi wan re kar kirine û di çarcoveya karên xwe dest bi dest kirine.

Piştire wan hizra avakirina çapxaneyek anîne gorê ku ev gotarane yekem car li Almanyayê li sala 1605`an a Zayînî de çap kirine.
Piştî sedsalan, hikûmetên weke Parîs û London dest bi weşandina nûçeyên fermî kirin.

Paşê, faîlên nûçeyan her şeş mehan carekê, bi tîpên latînî di bin navê Mercurius Gallobelgicus de, di navbera salên 1594-1635an de li Kolnê dihat weşandin û paşê wenda dibû.

Lê derketina navê rojnamevanî di dîroka rojnamevaniyê de vedigere bo sedsala nozdehan, nemaze bo yekem car li Amerîka, berî her cihekî din, navê rojnamevanî bû beşek ji lîstka rojnamevaniyê.

James Jordan Bennett (1795-1872) yekem dîmena xwe ya rojnamevanî li New Yorkê ji rojnameya New York Herald re kir, ku xwediyê wê û edîtorê wê bû.

Herçawan ev bixwe dibêje: Wî bixwe hem rola nûçeber hem sîxorî û hem jî nûçegihanek polîs lîstiye ku romalkirina tawana kuştina Helen Jewey di sala 1836`an de birê ve dibe.

An jî dîmena rojnamevan Horace Greeley li salên (1811-1872`an) bi rêberê Civaka Olî û Çandî ya Mormon Brigham Young re li sala 1859`an di forma pirs û bersivê de di New York Tribune de weşandiye.

Ev şêwaza diyaloga rojnamevaniyê wê demê ne hevpar bû, wekî Greeley diyar dike.

“Ev, bi qasî ku tê bîra min, bingeha axaftinê ya bi qasî du dejimêran bû, ji ber ku gelek tişt hebûn ku ne hêjayî weşandinê bûn, tevî ku min hemî bê bîra min û ji nû ve binivîsanda.”

Paşê, Joseph McColla belkî yekem nûçegihan bû ku ji bo weşanê bi serokê Dewletên Yekbûyî re hevpeyvîn kir; Ew “Andrew Johnson 1808-1875, 1867`an a Zayînî” de bû, Haşîşî hevpeyvînên çapemeniyê bi lez li Dewletên Yekbûyî belav bû. Thomson Cooper, ku di sala 1871`î de ji bo New York World xebitî, wekî yekem nûçegihanê cîhanê tê hesibandin ku bi Papa re hevdîtin û hevpeyvînek çêkir.

Ew bi wî karî serbilind bû, piştî wê jî hemû medya û nûçeyên ku heta niha jî tenê bi înîsiyatîfan re hevpeyvînan dikin bala wî dikişîne.

Li seranserê cîhanê wan got, “Dêra Katolîk dêra herî kevn e, û hevpeyvîn bi wê saziya olî re bi tevahî tiştek nû bû.
Îro serê sibê xwe rû bi rû didin nîşandan, dêr û çapemenî hevdu qebûl kirine.”

Rojnamevanên Amerîkî yekem bûn ku di sedsalên paşerojê de bi endamên kabîneya Brîtanî, serok û padîşahên Ewropî re hevpeyvîn kirin.

Piştî Amerîkiyan, Ingilîzan ji Ewropiyan zûtir dest bi hevpeyivînan kirin û li xwe mikur hatin ku Emerîkî pêşeng in.

Di sala 1902`an de, rojnamevanê Brîtanî William Steed (1849-1912`an) got: “Hevpeyvîna çapameniyê dahênanek bêhempa ya Amerîkî ye.
Her çend rojnamevanan ji bo demek dirêj gelek hevpeyivîn pêk neanîn jî, rojnamevanekî Amerîkî yê dawiya sedsala 19`an diyar kir ku çawa nûçegihanên Washington berê “ne guhdar û ne jî hevpeyivîn, lê bi hurmet bûn, di nav civakê de xwedî helwestek pêbawer ku ti carî di gel wan miamile nehatiye kirin.

“Bê guman, ev bêaqil e ji ber ku wan hevpeyivîn wekî adetek xirab û rêyek metirsîdar a ragihandinê di navbera zilamên me yên naskirî û mirovên asayî de pênase kirine.”


(1) Numb. 1.
The Oxford Gazette.
Published by Authority.
From Monday Novemb. 13 to Thursday Novemb. 16. 1665.

Çima di wê demê de dihat bawer kirin ku pêkanîna hevpeyivîn zirar e?
Bi rastî, ew tenê tişteke nekêrhatî bû. Birêveberê eyaleta bajarê Louisville Henry Waterson gilî li rojnamevanên ku bi wî re hevpeyvîn kirin li ser “şkestina riya hesinî ya nû” û “ vegerandin li salona otêlê de pêk anî.

Bi dîtina wî, hevpeyivîn zirar daye rêwîtiyê, ku di wê demê de nû bû. Wî ew wek bêrêzî bi nav kir û got ku zilamên navdar, yên desthilatdar, xwedî statuyek civakî ya bilind in. Rojnameger ji wan dûr bûn.

Wê demê digotin her kesê bixwaze bibe rojnamevan. Lê belê, li Dewletên Yekbûyî, ji ber nebûna cudahiya di navbera çînên civakê de - li gorî Ewropayê - ew kêmtir li dijî hevpeyvînên çapemeniyê bûn.

Bi derbasbûna demê re, pêkanîna hevpeyivînên çapemeniyê ji bo rojnamevanên Amerîkî û her wiha ji bo gelek rojnamevanên li derveyî Dewletên Yekbûyî bû pîşeyek hevpar. Ew dibe ku ji ber wekheviya nisbî ya jiyana giştî ya Amerîkî, ji bilî nebûna dabeşbûna çînên civakê be.

Piştî derbasbûna dehsalan, Cheese Cheese, Hershey’s, McDonald’s, û Starbucks li deverên din bûn bikirên nefermî yên Dewletên Yekbûyî, û hevpeyivînên çapameniyê zû ji Dewletên Yekbûyî bi aliyek nefermî ve hatin şandin.

Ji bo rexnegirên Ewropî yên ku hevpeyivîn kirin, ew vexwendinek bû ji bo kesên xwedî xeyalên wêjeyî yên bilind. Forma mînakan a axaftina rojnamevaniyê gotarek bû, bi gelemperî analîzek (ne rapor) bû bo bûyerên siyasî û aborî.

Wusa dixuye ku ew bêtir lêkolînek odeya guherandinê bû. Ji bo vê jî diviyabû rojnameger xwedî asteke edebî û analîtîk bin. Di serî de hevpeyivînên çapemenî hêviyên wî yên bilind ên rewşenbîrî û edebî paqij kirin, mîna utîkirina kirasekî qijkirî.

**Çavkanî: Înternet.**

## Nerîna



**“Mistefa Hicrî”:**

**“Roja 10ê Xakelêwê, wateyekî hevpar bal xelkê Kurdistanê heye, ev jî domandina rêbaza pir serweriya Şehîdan û zindî ragirtina rêbaza neteweyî ye Pêşewayê Kurdane.”**





**“Mistefa Oziçelik”:**

**“Divê em li himberî neheqîya ku li Abdûllah Zeydan û li gelê Wanê hatîye kirin derkevin, lê xwe ji şîdetê jî dûr bixin. ”**




**“Jens Stoltenberg” :**

**“Piştgiriya Komara Îslamî û Koreya Bakur ji Rûsyayê encamên giran ên cîhanî heye”**



**“Anthony Blinken”:**

**“Armanca Amerîkayê avakirina dewleteke Filistînê ye, her çend ev armanc dûrî destkevtiyê ye.”**

# Dilgiraniya Rûsiyê ji nêzîkatiya Ermenistanê ji bo Yekîtiya Ewropa!



**N. Eskender Ceiferî**



Ev çend sal in ku Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkiyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenistanê.
Piştî ku Rûsiyê li ser mijara Qerebaxê pişta Ermeniyan berda, niha Ermenî nêzîkî Ewropayê dibin û ev jî nerazîtiya Rûsiyê li pey xwe ve tîne.
Roja 30’ê Marsa 2024’an Rûsiyê bi awayekî fermî hişdarî da Ermenistanê ku nabe nêzîkî Ewropayê bibin.

Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, ku wek Artsax jî dihat naskirin, dewletek bû ku di asta nevnetewî de bi fermî nedihat naskirin. Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiya bû.

Ew, heman dewlet bû ku Azerî û Tirkan têk bir.
Heya berî têkbiriba wê ji aliyê Tirkan ve, pişta Ermeniyan bi Rûsiyê germ bû. Lê piştî dagirkirina wê û bêdengbûna Rûsiyê, Ermeniyan bera xwe da Rojava.
Komara Nagorno Qerebaxê li başûrê rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenistanê re hevsînor e.
Ji danezanîna serxwebûna di 1991’an vir ve, zimanê fermî yê Qerabaxê, Ermenî bû. Lê piştî ku Azerbaycanê dest danî ser vê navçeyê, Azerî kire zimanê fermî.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek pişta Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi eşkere pişta Ermeniyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo parastina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo parastina mafê Ermeniyan li wir tev nagere.

Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermeniyan û hemû wan pêkhateyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.

Mijar kûr dibe û di rojên derbasbûyî de Tirkiyê bi awayekî eşkere ragihand ku ewê li hemberî Ermenistanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenistanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenitsan li pişta wê ye.
Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenitsanê ku sala 2011’an hatiye encamdan, li vî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurdan dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzidî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.
Helbet tê gotin ku Ermenistan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermeniyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermeniyan e. Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azeriyan, lê belê navçeyên din hemû yan jî piranî Ermenî ne.
Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.
Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Amerîkayê ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguhestin û ew bûye sedema alozî, şer û kuştinên zêdetir.
DYA hweisa Tirkiye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbeycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.
Beriya niha jî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehandibû, heta niha hejmara çekdarên Sûrî li Azerbeycanê gehiştiye 850 çekdaran û bendewarî hene hejmarekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkiyê ve bên şandin.

Di şerê Azerbeycan û Ermenistanê de bi dehan çekdarên Şûrî yên ku Tirkiyê ew şandine şerê Ermenistanê, hatin kuştin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di 48 demjimêrên borî de, 36 çekdarên Sûrî yên ku Tirkiyê ew şandine eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne.
Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine kuştin.
Tirkiye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbeycanê dike, hejmarek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevlî wî şerî kirin. Li gor zanayriyên Rewangehê, heta niha Tikriyê 1200 çekdarên Sûrî şandine şerê Qerebaxê.
Hevdem serokwezîrê Ermenistanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kir, da ku pişt rast bibin ku Tirkiye destê xwe nexe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagrono – Qarabaxê.
Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenistanê ve di wî çaxî de hat ku şer di navbera Ermenistanê û Azerbycanê da derketî û Tirkiyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kiribû.
Balyozê Ermenistanê li Moskowayê Fardan Taganyan jî daye zanîn ku Tirkiye 4 hezar komên çekdar ê Sûriyê bo şer li dijî Ermenistanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenistanê şandine.
Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiriye Tirkiye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenistanê de bikarbîne.
Îran tevî ku di eniya Rûsiyê de ye, lê helwesteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê parastî bin.
Ji destpêka 2024’an ve ev çendîn car in ku Rûsiye bi awayên cuda gefê li Ermenistanê dixwe lê Îran bê deng e û dixwaze bizane dê çi biqewme?
Tevî muhafizekarbûna Îranê, lê dîsa jî dibe ku Rûsiye pişta Tirkan bigire da ku sînorê Ermenistan bi Îranê re bê qutkirin.

# Dîtîna Min “MUZEXANE” bo heçî neteweyekê girînge



N. Roni Mazlum Deli



Ew welatên ku ez diçim betlenaye pir girîngîyê didim dîtina Muzexaneyan, her car ku diçim Muzexaneyek tiştên nû, cûda û balkêş dibînim.

Muzexane saziyek e ku ne bi armanca qezenc kirine hatîyê avakirin, saziyek daîmî ye, ji civakê re xizmet dike. Ji bo lêkolîn, berhevkirin, parastin, şirovekirin, jêderjistin û pêşandana tiştên madî, ne madî û fikrî tên avakirin.

Muzexane civakî ne, gelemperî ne, gihiştî ne, navketî ne, cîhêrengî ne, û domdarîyê pêş dixin.

Muzexane saziyeke ku tiştên ku ji bo mirovatiyê muhîm in nîşan dide, ew tişt adet, kultûr, huner, dîrok, û awayên jîyane eleqeder dike.
CUREYÊN MUZEYAN:

Komele ya Yêkîtîya Muzexaneyan bi navê “Museana” Muzexane bi 5 cureyan bi nav dike.

**Huner**
**Dîroka Xwezayî**
**Dîroka miletan, netewan**
**Etnolojî û Karsazî**
**Zanistî û Teknolojî**

Hinek Muzexane li ser yek ji van kategorîyan pêk te, lê nimûneyên Muzexaneyan hene ku du an jî zêdetir ji van kategorîyan pêk te.

Muzexaneyek bi giştî ve berhevoka xwe heye; ji tiştên ku her tim li pêşangehê ne, jê re ” Komkirina daîmî, berhevkirina sabît ” jî tê gotin.

Ew bi giştî ve parçeyên, tiştên Muzexaneyê giranbiha, bêhempe û yekane ne, wek wêne, peyker, û/an karên arkeolojîk in. Di gelek Muzexaneyan de jî cihên pêşengehên demkî hene.

**MUZEXANE ÇAWA ÇÊBÜ**

Muzexane xwedî dîrokek dûr û dirêj e û gelkî dewlemend e. Ew di dema Alexander ê Mezin ve, ji peyva ” Mouseions” hatiye girtin. Dest pêk de ew wek navendek perwerdehîyê dihat bi kar anîn. Di dema Ronesansê ( Renaissance) de ev guherî û cihê xwe da berhevkirîyên berhevkaran.

**MUZEXANE JI BO ÇI BAŞIN Û GIRÎNG IN?**

Muzexane xezîneyên civakan, miletan, netewan in, cihên ku kal, pîr, zarok û ciwan dikarin gelek tiştên girîng jê fêr bibin. Ew mêjûya dîrokê ye, mêjûya huner û çand e, mêjûya zanistî û teknolojî ye, Etnilojî ye. Bi serdana Muzexaneyan em dikarin li ser Cîhana li dora xwe bêtir fér bibin û tê gihiştina xwe ya li ser mijarên cûda zêde bikin, ji ber vê yekê jî Muzexane pir girîng in.

**MUZEXANEYA HERÎ NAVDAR A CÎHANÊ**

Helbet gelek Muzexaneyên navdar û girîng hene, lê hinek ji wan, wek Muzexaneya Louvre li Parîs ( Musée de Louvre Pari) gelek hatine hatine naskirin, Muzexaneya ku herî zêde di Cîhanê de tê zîyaret kirin û yek ji mezintirîn Muzexaneyan e, ji bo nimûne, Muzexaneyeke ku pir caran ji bo nîşandana huner, zanistî, dîrok an bi çandê te bi kar anîn. La Louvre Musée, ew yek ji mezintirin Muzexaneyên hunerî, li Cîhanê ye, û ji peykerên Pêşdîrokî û Sarkafagî yên Misrî bigre Heya tabloya herî navdar a Cîhanê Mona Lisa.

Muzexaneya herî mezin a Cîhanê ye ku bi tevahî cîhê pêşengehê hema hema 73 000 metre çargoşe û 10,000 dereceyan e.

**KEVINTIRÎN MUZEXANEYÊN CÎHANÊ**

Wek kevintirîn Muzexaneyên Cîhanê, Muzexaneyên jêr tên naskirin.

**Capitol Musea, Roma**
**Vatican Musea, Italî**
**Prado Museum, Spanya**
**Ashmolean Museum, UK**
**Muzexane hunera bedew û Arkeolojîya Brabançon, Fransa**
**Charleston Museum, VS**
**Herzog Anton Ulrich Museum, Almanya**

**MUZEXANE HERÎ XWEŞIK A CÎHANÊ**

Helbet gelek Muzexane xweşikin, herkes cûda lê dinêre lê li gor ” Travellers Choice Awards of Trip Advisor” ” Musée d’orsay li Parîsê, Muzeya herî xweşik e di Cîhanê de lê ew dem bi dem tê guhartin.
Li Cîhanê nezî 95 000. Muzexane hene, lê hinek ji wan ji ber pirsgirêkên aborî girtî ne.
Gelek miletan Muzexaneyên xwe li derveyî welatê xwe jî hene, wek Ermenîyan, Cuhîyan, Tirk.

Ji bo me Kurdan jî hebûna Muzexaneyek li Diaspora gelek girîng e. Muzexaneyek netewî ku ji berjèwendîyên biçûk û şaxsî dûr be, Muzexaneyek pir berfireh, li Brukselê, paytexta Ewropa pêwîste. Ji bo ku Bruksel paytexta Ewropa ye û cihekî pir girîng digire.

Wek min got, Muzexaneyek pir berfireh ku tê de Dîroka Kurdan, hemû komkujî û genosîdên li ser Kurdan re derbas bûyî ne, cil û bergên Kurdî ji her
mintiqe ( cil û bergên mêr, jin, zarok û cîwanan), çanda Kurdan, mûzîk û folklora Kurdan, kultûr û gelek tiştên din ên kultûrî hebe.

Lê avakirina ew Muzexane ne tenê karê kesek yan Komeleyek e, ji bo ku mesarîfê vî karî zede ne pêwîstîya alîkarîya Harêma Kurdistan heye.

Konfederasyona Navenda Revenda Kurdistanî dikare li ser vê mijarê rolekî girîng bide ser milên xwe, Hikûmeta Harêma Kurdistan re bikefe nav dîyalogek û zûtirîn kat gava pêşîn bavê je.

Ew 30 sal in di hemû xewn û xeyalên min de Muzexaneyek bi vî rengî heye. Min li gel hemu Kurdên ku ez nas dikim behsa vê xewn û xeyala xwe kirîyê.

Mixabin hinek Kurdan ji van xewn û xeyalên min îstîfade kirine, li gel min ji bo avakirina Muzexaneyek komele jî avakirin e, lê ez nîv rê hiştîme, bersiva min jî nadin. Heyf û mixabin.

# Bawerî, Felsefe û Ziman, Mirov nenivîse nabe



N. Hasan Harrani



Ewqas pirsgirêkên me hene ku mirov gelek caran neçar dimîne bê ka mirov pêşî dest bavêje kîjanê.
Di vê kurtenivîsê de dixwazim li ser mijara bawerîyan, felsefe û ziman rawestim.

Ev mijar bi raya min mijarekî herî girînge. Sedema hasilbûna vê mijarê ji ber bawerîya rêya heq bû.

Wekî hun jî dizanin her miletek dema bawerîyek, felsefeyek an jî ramanek biafirîne teqez bi zimanê xwe dirist dike. Ev tiştekî asayîye.
Bawerî û ramanên felsefî yên her miletekî bi zimanê wîye.

Ev dişibe avahîyan.
Ti li ku xanîyek çêbikî tuyê kevir û xerca wî jî ji wê axê bihevirî.

Ev rastîyeke.
Ola îslamê ya Erebaye û bi zimanê wan hatiye diristkiin. Rih û hestên wî miletî, kevneşopî ûadetên wan dide nasîn û hisandin.

**Ola cihûyan ya Cihûyane û bi zimanê wan hatîye diristkirin. Ola Zerdeştî jî bi zimanê Kurdîya kevnare hatîye diristkirin.**

Mirov dikare gelek mînak bide lê vana besin.

Ev tişt her wiha jibo rêçûnên felsefî û ramanî jî derbase. Felsefeya Manî bi zimanê Farisîhatîye kirin. Her çiqas afirînerê vê felsefê Kurd be j. Lê dema te bi zimanê miletekî din çêkir tuyê rih û hestên xwedîyê wî zimanî têde bidî raxistin û teşekirin.

Felsefeya Greekîyan bi zimanê Grekî çêbûye û hemî têgeh û rih yê wan dide nîşandan.

Ola Zerdeştî bi zimanê Kurdîya kevnare dirist bûye û piştî 2700 salan dîsa bêhna Kurdî ûgermahîya rihê Kurdî jê tê. Kesekî hîna jî nekarîbûye bi temamî xera bike.

**Dîsa mînaka bawerîya Rêya Heq û Êzdayîyê jî di vê xalê de mirov dikare nîşan bide.Rêya Heq jêderk û avahîya wî tev Kurde û Kurditanîye. Hemî peyv û têgehên wî Kurdîne. Bawerîyek gelek kûr u xurte. Lewma jî her tim bûye sedema metirsîyê jibo hêz û serkarîyên miletên din.**

Lewre hêza herî xurt û gewre hêza ramanî û felsefiye. Ev di dîrokêde jî wihabû îro jî wihaye.Lewre têkilîya kar û barê civakî, dan û standinên nav mirovî û nav miletî bi rêya ramanê têçêkirin û amûra vê yekê jî ya bênîwaş ziman e. Loma jî ti hêz heya îro negihaştiye hêza raman û ziman.

Dema hêzekî ramanî xurt û zexim be û ti hêzekî nekaribe xera bike an jî ji holê rabike, serî li metoda rêya manîpûlekirinê didin.

Ev rêya xerakirinê her tim di dîroka milet û mirovahîyê de hatîye ceribandin û hîna jî metoda herî xurt eve. Îro ev tişt bi wergirtina hişmendî û famayîyêde tê bikaranîn.

Wekî bawerîya rêya heq ku tiştên bi serê wî de hatîye mînaka herî berbiçav û dramatîke.Ev rastîyek bênîqaşe ku diristkirina rêya heq bi zimanê Kurdî hatîye kirin. Wekî Êzdayîyê.



Lê çi ecêbe ku ewqas lîstandin li ser vê bawerîyê çêbûye û ewqas hatîye manîpûlekirin.Bawer nakim ku ti ol û ti bawerîyek wekî vê bawerîyê hatibe xerakirin û manîpûlekirin.Ev xerakirin di cihê herî girîng de hatîye destpêkirin. Di têgeh û peyvan de.

Di têgeh ûpeyvên ruknî yên hîmî de çêbûye.

Sazkarîya peyvan yên mikabil bi heman şêwe, deng lê di bingeh de di warê nêrîn û famkirinêde û wateyê de bi temamî dijber hatîye diristkirin. Ev îcadekî herî xurte ku mirovahîyê jibo têkoşîna ramana dijber afirandîye.

Binêrin temamê peyvên bawerîya Elewîtîyê an jî Riya Heq bi Kurdîne lê bi guhestina hinek tîp û dengan hatiye farisîirin û bi vî awayî ji wate û armancên xwe an dûrketine an jîveguhezîne dijberê xwe. Ev karesatekî mezin e.

Bi zanîna min divê ev bawerî jibo bigihêje kok û cewherê xwe divê pêşî kifşa peyv ûtêgehan ji nûve bike. Wê demê wê herkes bibîne ku rastî pir pir cudaye.

Xwezî dem û hêza min hebûya min di vî warî de xebatek berfireh bikira. Lê ne gengaze.Hêvîdarim kesên bi mereq li ser vê mijarê hûr bibin

# Rêûresimên Newrozê di nav Kurdên li Xorasanê



**N: Rojan Kirmanc**



Li bajarên Xorasanê welatî mehek beriya cejnê dest bi paqijkirina malên xwe dikin û du hefte beriya cejnê jî cejna Şînkatiyê(Sebzeyê) pîroz dikin û cilên nû ji xwe dikin

Û di demjimêrên dawîn ên beriya sersalê de Heft Sîn datînin û li benda pîrozkirina sersalê dibin, dema sersal tê biçûk diçin malên mezinan dibînin û pere û diyariyên eydê yên biçûk ji wan distînin, paşê yên mezin serdana malên biçûkan dikin.

Heftsîn ji sêv, sazabe simaq, sîrik, sîrke, Sincû, Semenû pêk tê.

**Sêv sembola tenduristiyê ye**

**Keskatî sembola nûbûnê ye**

**Sumaq girêdana dilan sembolîze dike**

**Sincû sembola hezkirinê ye**

**Sîrke(Tirşe) ji holê rakirina qirêjiyê nîşan dide**

**Sîrk sembola dezenfektekirinê ye**

**Semenû xwarinek xweş e ku ji genim tê çêkiri û sembola sebrê ye.**

Xelkê Xorasanê bi serê xwe an jî di dawiyê de li gel mirovên malbatê yan jî hinek hevalên xwe Cejna Newrozê pîroz dikin.

Ew agirê Newrozê pîroz nakin, bi rastî jî pirraniya mirovan tiştekî derbarê agirê Newrozê nizanin, her çend hinek kes jî hene ku ji agirê Newrozê baş dizanin û bi bêdengî û dizî lê digirin ji ber ku li Xorasanê ev yek qedexe ye.

Der ketin ji mal û dîlana Kurdî û Agirê Newrozê wir qedexe ye.

**Kes nizane ji kî demê cejna Agirê Newrozê qedexe bûye, lê her çi heye demeke dirêj e, belkî li demê de ku koçberî wir bûne li Xorasanê, di nîvê rê de, dema ku hewa sar bûye, agirek pêxistibin, agir ji ber ku zarokên xwe yên nexweş xilas bikin, lê hema zarokên wan mirine û di dawiyê de zarok û agir bi hevra kirine veşartine.**

An jî ji bo ku dema vedigerin mala bavê xwe rêya xwe winda nekin, agir bi rê nîşan kirin e.

Lê, di demên ne ewqas dûr de bi taybetî li gundan lidarxistina cejinê cuda bûye.

Ji ber ku piraniya xaniyan ji girekê hatibûn çêkirin, ji bo spîkirina dîwarên derve yên xênî ku jê re Şultî dihat gotin, axeke taybet bi kar dianîn.

Li gundan rojek beriya cejnê nanekî taybet, wek fetîr kumêj û îngice cureyekî pîraşkî, ku bi sebzeyên Biharê tijî dibû, çêdikin û nanê taybet bi meyûj û zerdelên hişkirî bo xizmetkirina mêhvanên cejinê amade dikin.

Zarok bikom diçûn ser banan û di çîmentê re tûrikek diavêtin hundirê malê û xwediyê malê jî çend , Gûz an jî şîrîniyên xwemalî dixistin nav tûrik û zarokan tûrk dikişand û diçûn mala din,Zarok wiha mal bi mal digeriyan.

Ji aliyek din jî ger di vê navberê de malbate li qîzeke malbatek din xwazgînî kiriba.

Bersiva erê an heman rizamendí di roja Newrozê de li malbata qîzikê werdigrtin û xortên û dezgirtî hebûn ji bo dezgirtiyên xwe zêr, kinc û ronê zer û berxe wek diyarî dibirin.

Adeteke din a xelkê gund ew bû ku serê sibê her kes bi karê gund re mijûl dibû û dema firavînê li hev diciviyan û rojên destpêkê yên cejinê goşt û birinc çêdikin û dixwarin û paşê dîlan dikirin di koman de stran digotin û direqisîn Ciwan bi lîstikên wek Şef Çertovnek, Hefdoreş Keren, Şel Qol, Dargog Çerçovo re mijûl dibûn.

Li quncikek din keçên ciwan perçeyek ji zêrên xwe, wek zengil an jî tiştekî din, dixin kulmekê û bi qumaşekî satin li ser cereyê dixin û komek stranekê distirin, paşê xortek destê xwe dixe cerekê û bextê yekî ew zêran derdixe, zengil aîdî her kesî bû, yanî tişta ku dixwest bi dest xist û ev yek berdewam dike heta ku her kes bigihê miraza ku dixwest.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Kuştin û birîndarkirina 91 kolberan di heyama heyvekê de

Li gorî amara Rêkxirava Mafê Mirove Hengawê, di heyama meha Adara 2024an de, aliyê kêm 91 kolber li ser sînorên Kurdistanê hatine kuştin û birîndarkirin ku %66 bi sedema teqeya rastewxwe a hêzên çekdarên rejîma Îranê bûne qurbanî, ev amara gorekî heyva fêvriyê 24 halet wate %36 zêde bûye.



Li gorî vê raportê, 13 kolber û kasibkar hatine kuştin û 78 kolber jî birîndar bûne, di vî heyamî de aliyê kêm nûciwanekî kolber û xelkê Dîwandere yê bi navê Hestiyar Ebdulkerîmî bi sedema sir û seqamê canê xwe ji dest da, û 5 nûciwanên din yên kolber bi teqeya rastewxwe a hêzên çekdare rejîma Îranê li ser sînorê Bane, Newsûd, Seqiz û Merîvanê hatine birîndarkirin.

Zêdetirîn haletên kuştin û birîndarkirina Kolberan 44 halet bûye ku li sînorê parêzgeha Sine hatiye tomarkirin.

## Rîjîma Îranê li kuştina Sara Tebrîzî de rol hebûye

Mirîna cihê şik û gumanê a çalakvana siyasiya Azerî ya rûniştiya bajarê Têhranê ku rojekê piştî gazîkirin bo Îdareya Îtilalatê li mala vê de termê vê hatiye peydakirin, li torên civakî de dengvedaneke berfireh hebûye.



Çalakvana siyasî û girtiya siyasiya berê, "Sara Tebrîzî" rojekê piştî gazîkirin bo îdareya îtilaat a rêjîmê li bajarê Têhranê , termê bêcane vê keça temen 20 salî, li 5ê Xakelêweyê de li mala babê vê de li bajarê Têhranê, hatibû peydakirin û gefxwarinên hêzên rêjîmê li vê keça Azerî, egera vê yekê zêde dike ku li mirina vê keçê de, rêjîma Îranê rol heye.

Mirina cihê şik û guman a "Sara Tebrîzî" dengvedaneke berfireh li torên civakî de hebûye û berteknîşandana hejmareke zêde ji çalakvanên siyasî û medenî li pey xwe aniye û mirina vê keça Tewrêzî, bi kuştina hikûmî binav dikin.

Sara Tebrîzî, li heyva Xezelwera 1402 de 10 rojan li girtîgeha Êvînê de hatibû ragirtin û pêka dawî zanyariyên belavbûyî, hêzên îtilaata rêjîmê gef li vê xwaribûn ku hekî hevkariyê digel rêjîmê neke, dê wêne û datayên li telefona vê de belav bikin.

Rêûresma serxweşiya vê keça Azerî li roja pêncşemî 9ê Xakelêweyê li bajarê Têhranê de bi rê ve çoye.

## Tirajîdiyaya li ser kolberan dawî pê nayê

Zarokekî temen 15 salî li dema kolberiyê de li sînorê bajarê Newsûdê ji bilindahiyê çiya re kevte xwarê û bi tundî birîndar bû, piştî 2 rojan bavê wî li dema kolberiyê de bi sedema sekinîna dil canê xwe ji dest da.



Pêka rapora "Çawnews"ê zarokekî 15 salî bi navê "Mîlad Mihemedî", temen 15 salî û kurê "Mihemed'Bayir" xelkê gundê "Zêran"a ser bi bajarê Ciwanroyê, li dema kolberiyê de ji bilindahiyê veresiya û kevte xwarê û bi tundî birîndar bû.

Herwisa bavê vî zarokê Kolber li roja Yekşemî 5ê Xakelêweyê li dema kolberiyê de li sînorê Newsûdê, bi sedema sekinîna dil canê xwe ji dest da.

Karesatek ku bo vê malbatê qewimiye, mînakek ji jiyana gelek kesan li Rojhilatê Kurdistanê ye ku bo peydakirina pariyek nanê helal, neçar bi kolberiyê dibin.

Gorî amaran tenê li 7 rojên sala nû de, aliyê kêm 10 kolber ku 3 ji wan zarok bûne, li ser sinûran hatine kuştin û birîndarkirin

# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (467)

